Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1038 8-Sibat- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Kurd xwe asîmîle dikin

**Mûrat Atabay: Jiyaneke bi zimanê dayikê daynin ber zarokên xwe. Dema me dest bi dibistanê kir, me qet bi vî zimanî nizanîbû. Divê em zimanê xwe yê dayikê teqez bikin beşek ji jiyana xwe.**



Serokê Şaxê Egîtîm-Senê yê Wanê, Mûrat Atabay got, asîmîlasyon polîtîkayeke dewletê ya bi zanebûn û bi salan jî kiriye ku otoasîmîlasyon yanî xweasîmîlasyon bi pêş bikeve. Atabay asta otoasîmîlasyonê weke tehlûkeyeke mezin bi nav dike.

Serokê Şaxê Sendîkaya Kedkarên Zanistî û Perwerdeyê (Egîtîm-Sen) yê Wanê Mûrat Atabay bi bîr xist ku di serdema nû ya perwerde û hîndekariyê de ya doh dest pê kirî de perwerdeya bi zimanê dayikê nayê kirin û pirsgirêka asîmîlasyonê dewam dike. Atabay got, ji ber ku perwerdeya bi zimanê dayikê ji bo zarokên Kurd nayê kirin, jî gelek pirsgirêk ji bo zarokan jî derdikevin holê: Astengiyên elaqedarî serketina akademîk, baweriya bi xwe û bipêşketina civakî û zanebûnê.

Murat Atabay bal bire ser polîtîkaya perwerdeyê ya bi yek zimanî ku li ser gelê Kurd û gelên din tê ferzkirin û got, "Di perwerdeyê de pirsgirêka herî mezin ev e. Malbat jî zanin ku neçar dimîne bi zimanekî nizanin, zarokên xwe perwerde bikin. Ji ber zimanê ku îdeolojiya fermî ferz dike, meyla malbatan jî mixabin ber bi vî alî ve guheriye. Ji bilî zimanê dayikê mixabin hewl didin ku zimanê fermî hînî zarokên xwe bikin."

### Psîkolojiya zarokan xira dike

Atabay bal bire ser pirsgirêkên psîkolojîk ên bi zarokên bi zimanê xwe yê dayikê nayên perwerdekirin û got, "Bi xwe bawer nabin, nikarin xwe bi hêsanî bînin ziman, pirsa tê kirin fêhm nakin, nikarin bi têrkerî bersivê bidin. Ji destpêkê ve bandorê li siberoja zarokan dike. Li gel pirsgirêkên psîkolojîk, kêmasiya akademîk jî rû dide. Zarokên ku bi zimanekî jê fêhm nake û nikare xwe pê îfade bike, li gorî zarokekî bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeyê dibe, li paş dimîne. Kêmasiyên di vê mijarê de li de tê dîtin, zarok dema bi du zimanan mezin dibin, serketina wan a di perwerdeyê de zêdetir dibe û got, "Dema ku ne bi vî rengî be, bivênevê zarok ji aliyê psîkolojîk ve xwe ji zarokên din kêm dibîne. Têgihiştina 'em ji wan kêm in' bi wan re çêdibe. Lewma li hemberî zimanê xwe nerazî dibe û dibêje, 'Ji ber ku ez bi vî zimanî hîn bûme, nikarim serketî bibim'. Dibe ku ev nerazîbûn bi zanebûn hatiye afirandin. Ev têgihiştin li ser zarok û malbatê tê ferzkirin. 'Eger tu bi vî zimanî jiyanekê destnîşan bike, li nava Komara Tirkiyeyê cihê ku tu karibe xwe bigihîniyê diyar e'. Ji ber ku ev têgihiştin bi zarokan û malbatê re hatiye ferzkirin, kes vê carê li hemberî zimanê xwe yê dayikê nerazîbûnê nîşan dide. Dibe ku vê yekê dikin yek ji amûrên herî girîng ên asîmîlasyonê. Pêvajoya otoasîmîlasyonê mezintir dikin. Otoasîmîlasyoneke bi daxwaza xwe ferz dikin."

### Zimanê fermî nizanibin jî dikarin serketî bin

Serokê Şaxê Egîtîm-Senê yê Wanê Mûrat Arabay got, asîmîlasyon polîtîkayeke dewletê ya bi zanebûne û bi salan e jî otoasîmîlasyon bûye metirsiyeke mezin. Murat Atabay di dawiyê de ev bang kir: "Em bang li malbatan dikin, dest ji têgihiştina 'eger bi zimanê fermî nizanibin, nikarin bi ser bikevin' berdin. Jiyaneke bi zimanê dayikê daynin ber zarokên xwe. Dema pêş, zarok jixwe hînî zimanê fermî dibe. Dibe ku zarokatiya me hemûyan bi vî rengî derbas bûye. Dema me dest bi dibistanê kir, me qet bi vî zimanî nizanîbû. Divê em zimanê xwe yê dayikê teqez bikin beşek ji jiyana xwe. Hêvî dikim ku weke civak em ê kêmasiya vê yekê siberojê nebînin." **ANF**

tevahiya jiyana wan dewam dikin."

### 'Perwerdehiya pirrzimanî çêtir e'

Murat Atabay anî ziman ku weke di mînakên Fînlandiya, Swêd, Norwêcê

# Mala çandî ya Seîd û Necîbe bala geştiyaran dikişîne



Seîd û Necîbe di mala xwe de odeyek ji bo berhemên çandî veqetandine û gelek berhemên foklorî têde bi cih kirine. Ev berhemên dîrokî û kevin ên têde bi cih kirina bala geştiyaran kişandiye li ser xwe. Mirov di odeyê de çanda kevin a bav û bapîran dibîne.

Seîd û Necîbe hevjînên hevin û ji gundê Akoyan ê bajaroka Rewandizê ne. 43 sal in li gel hev jiyan dikin û niha li Rewandizê dimînin.

Van di bin banê xaniyê de, odeyek foklorî ji bo xwe çêkirine û li wir dijîn. Seîd û Necîbe piraniya dema xwe li vê odeyê derbas dikin. Seîd û Necîbe diyar dikin ku gelek ji vê odeyekê hez dikin û ji cihên din bi aramtire. Ode ji berhemên kevin ên çandî pêk tê. Seîd û Necîbe berhemên di odeyê de bi cih kirine, berê di jiyana xwe ya rojane de bi kar anîne û parastine. Weke bîrdariyekê li gel xwe hiştine. Odeya Seîd û Necîbe bala geştiyaran û mêvanan kişandiye. Dema ku mêvanên wan diçin, daxwazê ji wan dikin ku biçin wê odeyê de rûnin ku bi kelûpelên berê hatiye xemilandin. Di rastiyê de ev ode ne taybet girêdayî Seîd û Necîbe ne. Ji ber ku niha bûye cihê çanda bajaroka Rewandizê. Rojene kesên diçin Rewandizê serdan dikin û Seîd û Necîbe bi kêfxweşî wan pêşwazî dike.

Aliyên peywendîdar soz dane Seîd û Necîbe ku alîkariya aborî bide wan, daku odeyê mezin bikin. Ji ber ku gelek tiştên wan hene û di vê odeyê de cihê wan nabe. Pêwîstiya wan bi odeyek mezintir heye.

Niha hewa sare û berf dibare. Seîd û Necîbe supeya daran pêdixin. Bi çaya tehl serboriya jiyana xwe şîrin dikin. Ne tenê odeya wan çandî ye, cilûbergê wan jî Kurdewarî ye.

Seîd û Necîbe li gel hev diaxivin û çîroka dijwar a jiyana borî ji hev re dibêjin. Necîbe wê şevê bi bîra hevjînê xwe tîne ka, çawa ji destê çaş û leşkerên rejîma Sedam rizgar bûye. Seîd jî diyar kir ku weke du hevjînan bi xweşî û aramî heta niha bi hev jiyan dikin.

Seîd û Necîbe wiha qala jiyana xwe ya bi hev re kirin: "Em ji bo hev gelek baş in. Em hez ji hevdu dikin. Hêvî dikin ku hemû hevjîn weke me bextewar bin û temenek tîje xweşî û wefadarî bi hev re berdas bikin".

Niha odeya Seîd û Necîbe bûye sembala Rewandizê. Qaymeqamê Rewandiz û Rêveberiya Giştî ya Geştûguzarî ya Rewandizê serdan kirine û soz dane wan ku alîkariyê bidin ku odeya xwe mezin bikin û bibe cihekî çandî û geştiyar serdan bikin. **ROJNEWS**

Sudoku: Bersiv 47

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 5 | 9 | 2 | 6 | 1 | 3 | 4 | 8 |
| 4 | 2 | 8 | 7 | 5 | 3 | 1 | 6 | 9 |
| 3 | 6 | 1 | 4 | 9 | 8 | 5 | 7 | 2 |
| 2 | 3 | 6 | 9 | 7 | 5 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 5 | 3 | 4 | 2 | 6 | 9 | 7 |
| 9 | 7 | 4 | 8 | 1 | 6 | 2 | 5 | 3 |
| 6 | 4 | 2 | 5 | 3 | 9 | 7 | 8 | 1 |
| 5 | 8 | 7 | 1 | 2 | 4 | 9 | 3 | 6 |
| 1 | 9 | 3 | 6 | 8 | 7 | 4 | 2 | 5 |

Sudoku:Pirs 48

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 1 | | | 4 | 2 | 8 |
| | | | | | 4 | | | |
| 4 | 3 | 6 | | | | 1 | | 7 |
| | | | 8 | 3 | | | 4 | 5 |
| 7 | | | | 4 | | | | 3 |
| 8 | 4 | | | 5 | 2 | | | |
| 6 | | 7 | | | | 5 | 3 | 1 |
| | | | 6 | | | | | |
| 9 | 1 | 2 | | | 5 | | | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Aktîf (Fransî)** | **Çalak, bibandor, zindî, bi liv û tevger, şixulker. Kesê pir dixebite: Ev nivîskarekî aktîf e** |
| **Arşîv (Fransî)** | 1. Cihê ku kovar, rojname, wêne û berhemên din tê de tên parastin. 2. Materyalên ku tên parastin. |
| **Arkeolojî (Fransî)** | Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin. |
| **Aktivîst (Fransî)** | Çalakvan, çalakker. |
| **Ekolojî (Fransî)** | Şaxekî zanistê ku li ser têkiliya zindiyan hem ya di navbera wan de hem ya bi derdora xwe re hûrgiliyê dike. |
| **Hevpar** | Hevbeş, hevpişk, şerîke, şirket. |
| **Hevkar** | Şirîk, hevpişk, kesên bi hev re kar dikin. |
| **Konsept (Fransî)** | 1. Têgîn. 2. Têgihîştin, nêrîn, fikir. 3. Rêbaz. 4. Pergal. |
| **Rêgeh.** | Cihê ku rê tê re derbas dibe. |
| **Siruşt.** | Xweza, tebîet. |



## Felaketa Erdhejê li Bakurê Kurdistanê

*Di erdhejeke dijwar de li Bakurê Kurdistanê bi hezaran avahî hilweşiyan û bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Hikumeta AKP-MHP'ê jî di vê rewşêde de jî dijminahiya gelê kurd dike; bajarên Bakurê Kurdistan paşguh dike û ji aliyê saziyên dewletê ve hê tu alikarî ne gihiştine pir tax û bajaran. R5*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1038 8-Sibat- 2023 www.ronahi.net/ku/

# SIYASETA AKP'Ê JI BO GEL BÛ GOR!



Di erdhejeke dijwar de li Bakurê Kurdistanê bi hezaran avahî hilweşiyan û bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Hikumeta AKP-MHP'ê jî di vê rewşêde de jî dijminahiya gelê kurd dike; bajarên Bakurê Kurdistan paşguh dike û ji aliyê saziyên dewletê ve hê tu alikarî ne gihiştine pir tax û bajaran.

## Heyva Sor ya Kurd li hemû deverên ku pêwîsti heyî kon vedan



*Heyva Sor ya Kurd bi karê xwe yê lezgîn bal kişand ser pêvwstiyên gelê mexdurên erdhejê û da diyarkirin ku ew ji bo ku alikariya gel bikin amade ne û banga rêxistinên mirovî jî kir ku alikariyê bigihînin mexduran.R -3*

Ji pênûsa
DILYAR CIZÎRÎ

DIRÛTIYA DEWLETAN DI ERDHEJ Û BOBELATAN DE! R- 4

## Zekî Bedran

**Divê giranî bi tekoşîna bîrdozî bê dayîn R-5**

## Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê: Pêwîste piştevanî di asta herî bilind de bê kirin

*Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê diyar kir ku dewletên li ser xetên erdhejê avahiyên bihêz ên li hemberî erdhejê çênekirî ne lewma, berpirsyarên yekser û sereke yên vê hilweşîn û komkujiyê ne û got, em bang li gelên xwe dikin ku bi hawara banga alîkariyê ve bigihêjin R-3*

# Tekoşîna azadiya jinê pêl bi pêl belav dibe

Stêr Qasim da zanîn ku wek jinên Rojava ewê serhildan û çalakiyên bi dirûşma `Jin, Jiyan, Azadî` bidomînin û wê piştgirî bidin serketina serhildanên li rojhilatê Kurdistan û Îran ê. Herwiha got, Çi jina ku zilim lê bê kirin, emê piştgiriya wê bikin.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Bi hezarê salan e zor li jinan tê kirin. Li rojhilatê Kurdistanê û Îranê jî herî zêde jin ji aliyê rejima ve rastî îşkence û komkujiyan hatiye hatiye. Lê demeke li hemberî vê zorî û şidetê jinan dengê xwe vedan û li dijî rejimê, serhildana bi durişmeya 'Jin Jiyan Azadî' destpê kir.

Nêzî çar meh in li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê xwepêşandanên bi pêşengiya jinan bi dirûşma 'Jin, jiyan, Azadî' berdewam dikin. Her ku diçe xwepşandan belav dibin û têkoşîna jinan xurtir dibe.

Derbarê serhildana jinan li Rojhillatê Kurdistanê û Îranê, herwiha têkoşîna jinan ya li wir endama Koordînisyona Meclisa Jinan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hevseroka Desteya Rêveber ya Tora Serkirdeyên Aşîtiyê Stêr Qasim axivî û da zanîn ku Jin bi rêya vê serhildanê û têkoşîna xwe ya domdar, wê serkeftinê bi dest bixin.




**`Selhildan bi pêşengiya jinan hat destpêkirin`**

Stêr Qasim di destpêka axaftina xwe de bîr xist ku ji kevin de sîstema dewleta Îranê bi rêbazê darvekirinê politikaya tirsandinê li ser gelê Rojhilatê Kurdistanê pêk tanî û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tevî ku darvekirin di qanûna mafê mirovan de qedexe ye jî, rejima Îranê ev rêbaze bi kar tîne. Mixabin ne qanûn ne jî mafê mirovan di dewleta Îranê de nîne. Herwiha rojane komkujî li ser gelê îranê, bi taybet ser jinan pêk dihatin. Ji bo wê jî jinan ev zilm e li ser xwe nema qebul kir, rabûn ser piyan û selhildan bi pêşengiya wan hat destpêkirin."

**`Di bin navê islamê de jin tên kuştin ev jî wek suc nayê dîtin`**

Stêr anî ziman ku sîstema dewleta Îranê, zihniyeta paşverû li



ser jinan dide meşandin û axaftina xwe wiha domand: "Her kes baş dizane ku Rejima Îranê di bin navê islamê de zilm, tundî, êş û îşkence li ser jinan dide kirin. Bi hincet û di bin navên ol de, jin tên qetilkirin û tundî li ser wan tên kirin. Herwiha ji bo astengkirina rola jinan û bêparhiştina wan ji mafên wan, qanûnên giran danîne û her jin ji her alî ve bê maf hişti ye. Lewma jinan got êdî bese û serhildana tekoşîna azadiyê da destpêkirin."




**`Naxwazin jin bibe xwedî hêz`**

Stêr destnîşan kir ku tevî ewqas işkenceya li ser jinên Îranê tê kirin, cîhan bêdeng bû û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Heta niha jî civaka navdewletî li ser vê yekê bêdenge. Tevî ku niha jî jin li dijî rejîmê xwepêşandan û serhildan dane destpêkirin, mixabin ti kes têkoşîna van jinan nade diyarkirin. Lewra naxwazin jin bibe xwedî hêz. Ji ber ku baş dizanin ku hêza jinê wê gelek tiştan bi xwe re biguherîne. Ji bo wê jî bêdeng dimînin. Lê bêdengiya wan hêza jinê naşkine, jin bi riya têkoşînê li dijî sîstema desthilad ya kapîtalist wê bi ser bikeve."

**`Jinên Rojavayê Kurdistanê bûn mînaka tevayiya Cîhanê`**

Stêr di berdewamiya axaftina xwe de behsa hêz û têkoşîna jinên Rojava kir û wiha got: "Ji ber ku jinên Rojavayê Kurdistanê bûn mînaka tevayiya Cîhanê, her kes hêza xwe ji wan digre. Diyarê ku jinên Rojhilat jî hêza xwe ji jinên Rojava girtin e. Herwiha heta niha jî vîna têkoşîna xwe ji şoreşa jinan ya li Rojava digirin û dixwazin xwe birêxistin bikin, da ku karibin hêza xwe tê de diyar bikin û sîstema îranê vala derxînin."

Stêr got, Gelek sîsemên weke rejima îranê hene ku li dijî jinan dixebitin û naxwazin jin xwe vîn bin. Em jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji van kesan re dibêjin, 'hûn ti caran nikarin vîna jinê bişkînin'. Dema jin li ber xwe dide ti kes nikare wê ji vîna wê dûr bixe.

**`Ne jinên Rojhilat tenê çi jina ku zilim lê bê kirin, emê piştgiriya wê bikin`**

Stêr di dawiya axaftina xwe de got, wek jinên Rojava emê serhildan û çalakiyên bi dirûşma `Jin, Jiyan, Azadî` bidomînin û bi hêrs û hestê xwe piştgirî û destek bidin ku jin bi tekoşîna xwe ya azadiyê bi ser bikeve. Ne tenê jinên Rojhilat çi jina ku zilim lê bê kirin, emê piştgiriya wê bikin. Çimkî em jinên cîhanê tev yek in. Eger jinek mafê wê were xwarin, li kû be emê bi hev re daxwaziya mafê wê bikin û hêza jinan ji cîhanê re bidin xuyakirin."

# Kongra Star û Platforma Çalakiyên Ekolojîk banga hişyariyê kir

**Navenda Nûçeyan**

**Kongra Star û Platforma Çalakiyên Ekolojîk a Jinan derbarê erdhejê de daxûyaniyeke hevbeş weşand û bang li aliyên tekîldar kirin ku ewlehî û parastina şêniyan bi cîh bînin. Herwiha hişyarî da gel ku ji bo erdhejekê îhtîmal baldar tevbigerin.**

Erdheja ku navenda wê bajarê Kurdistanê Maraş bû, bandor li gelek bajarên din yên Kurdistanê, tirkî û herêmên rejima Sûrî kirin. Herî zêde bajarên bakurê Kurdistanê




pê bandor bûn û bi hezaran xanî hilweşîyan, bi hezaran kesan canê xwe ji dest da û bîrindar bûn. Herwiha li gor agahiyên heyîn hejmarekê pir zêde di bin xaniyên hilweşiyayî de hene ku hê kesê xwe negihandiyê. Herwiha li seranseri Suriyê jî zêdeyî hezaran canê xwe ji dest dan e ûbirîndar bûyîn e.

Di derbarê erdhejê de Kongra Star û Platforma Çalakiyên Ekolojîk a Jinan, bi daxuyaniyeke hevbeş ji malbatên mexdûrên erdhejê sersaxî û ji birîndaran re jî şîfaya lezgîn xwest. Her wiha hêvî kir ku kesên di bin xirabeyan de jî mane, werin rizgarkirin.

Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em bang li aliyên têkildar dikin ku erkên xwe yên parastina jiyana şêniyan û ewlehiyan wan bi cih bînin. Her wiha em bang li şêniyan dikin ku baldar bin, ji ber ku îhtîmala erdhejên peyhate dewam dike."



# Erdhejê huner çawa hejandiye

**Felaketên mezin ên di dîroka mirovahiyê de beşeke mezin a bîra mirovî pêk tînin. Ji ber wê jî huner xwe dûr nake ji vê bîrê.**

Şewatên mezin ên bajar û daristanan di wêje, şeêwekarî, şano û sînemayê de, lehî û şape û aşûtên yên gund û bajar dane ber xwe di gelek şêweyên hunerî de her xuya kirine. Her wiha xezeba volkanan jî di gelek cûreyên hunerî de cihê xwe girtine. Erdhejên ku welat wêran kirine jî xasma di huner de di bîrên civakî de cihê xwe girtine. Em ê îro berê xwe bidin hunerê şêwekariyê û tê de çawa erdhej çawa hatine teswîrkirin.

Erdheja mezin a 11'ê Adara 2011'an a li Japonyayê û paşê jî Tsûnamiya li peravên bajarê



Fukuşîma xist. Di felaketê de 16 hezar mirov mirin, 6 hezar mirov birîndar bûn û bêhtirî 2 hezar û 500 kesî bê ser û şûn bûn. Hunermendê Japon Jave Yoshimoto li ser felaketê 11 wêne çêkirin û bi pêşangeheke sala 2015'an jî ew nîşan dan.

**Tokyo 1923**

Japonya welatek e ku gelek caran erdhej lê bûye sedema felaketên mezin. Ji ber wê em wêne û lewheyên çapê yên li ser erdhejan gelekan dibînin. Yek ji wan jî erdheja 1923´yan ya ku li Tokyo û Yokohama xistibû. Hingê di felaketê de 140 hezar mirov miribûn. Ev çape bi lewheya çapê ya Nishimura Goun hingê diçe cihê erdhejê û vê lewheya çapê xêz dike.

**Lîzbon 1775**

Erdheja serdema rohnîbûnê

Yek ji erdhejên navdar ya sala 1755'an a paytexta Portugalê Lîzbonê bû. Hingê erdheja bi şida 8.5 bajar û bendera wê hema hema bi temamî wêran kir. Ev lewheya çapê wê nîşan dide. Melikê welat ê hingê Dom Josê, ji bo bajêr bi awayekî modern ji nû ve ava bike, ferman da. Ji ber wê jî melik bi keysbaziya xwe navdar e. Lê ji erdhejê re jî hatiye gotin, erheja ku li Portugalê serdema rohnîbûnê daye destpêkirin.

**Zelandaya Nû 1884**

Tesîra erdhejê û jin

Yek ji welatên weke Japonyayê girav û gelekî erdhej lê çê dibin jî Zelandaya Nû ye. Hunermend Sophie Andersonê sala 1884'an tuwalek çêkiriye ji bo ku balê bibe ser erdhejê û tesîrên wê. Jina ku xemgîn û ji taqetketî li ser xirbeyan dirêjkirî û li pey wê bajarekî bi temamî wêran bûyê xuya dike. Tuwal îro li galeriya huner "Auckland Art Gallery Toi o Tāmaki" ya li Zelandaya Nû tê parastin.

**Ozgurpolitika**

# Muzexaneya nîştimanî ya ji bo nişfê bê: Mala Miryem

Ji bo parastina bermayên kesên di enfalê de jiyana xwe ji dest dane li şûna hikûmet û partiyên Başûrê Kurdistanê, Rêxistina Hevkarî ya Elmanyayê 'Mala Miryem' li Germiyan vekir û xewna kesûkarên enfalkiriyan pêkanî. Berpirsên malê diyar kirin ku ev muzexaneya nîştimanî ji bo nifşê bê ye.

Di 18'ê Nîsana sala 2022'yan de Rêxistina Hevkarî ya Elmanyayê, li bajaroka Rizgarî ya Germiyan navendek ji bo komkirina berhemên kesên ku li ber enfalê ketine vekir. Navê navendê kirin Mala Miryem. Miryem ew jine ku negihîşte hezkiriyê xwe û heta mirinê li bendê mabû ye.

Merkeze Zerdeke cihê êşkencekirina beşek ji rûniştvanên resen ên bajaroka Rizgarî bûn. Li vir rojên bi êş û zehmet derbas kirin. Cihek êşan bû. Li vir bi destê rejîma Baas hatin êşkencekirin.

**Niha Merkeze Zerdeke Mala Miryeme**

Berpirsê Projeyên Rêxistina Hevkarî ya Elmanî ya li Kurdistanê Ziyad Fayiq li ser projeya vekirina Mala Miryen wiha axivî: "Cihê ku niha Mala Miryene avahiya herî kevin a bajaroke. Hikûmeta Baas a dîktator ava kiriye. Ew navenda rêvebirina bajarok û polîsan bû. Têde xelk diêşandin û êşkece dikirin. Me nexwest ew cih were rûxandin û bi kar bînin. Armaca me ew ku ew tiştên ku li xizmên enfalkiriyan kom bikin, li vir bi cih bikin."

Pêla enfalê tijî çîrokên rengareng ên bi êşin. Yek ji çîrokan negihîştina Miryem û dezgirtiyê wê ye. Navê wê li vê mala berhemên enfalkiriyan lê hatiye bi cih kirine.

**Miryem kê bû?**








Ziyad got: "Miryem ew jin bû ku ji berî destpêkirina pêla enfalê, li pismamek xwe tê mer kirin. Ji berî ku bibin, hemû amadekarî hatibûn kirin, proseya enfalê destpê dike. Dezgirtiyê wê tê enfalkirin. Ew jî piştî enfalê êdî nazewice. Tenêtiyê dihilbijêre. Piştî demekê ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest dide. Kelûpel û çîroka wê bi tenê dimîne. Me jî guncav dît weke bîranînek ji bo vê jinê, navê vi bikin Mala Miryem."

Her çiqas Mala Miryem hîn temam nebûye, lê ev saleke hatiye vekirin, lê ev tiştên ku li malê hatine bi cih kirin her yekê çîrokekî xwe heye.

**Çîroka pêşmergeyên bira**

Li ser vê çîrokê Ziyad wiha got: "Yek ji çîrokên di nava vê malê de, sindoqa cilûbergane. Çîroka du birane. Birayek pêşmergeye û birîndar dibe. Birayê din ji bo rewşa wî bizane çawane serdan dike. Di wê demê de di pêla enfalê de herdu jiyana xwe ji dest didin. Dayika wan bi tenê dimîne. Dayika wan tiştê wan radike û li gorî wê, wê rojekê her vegerin. Di vê demê de dayik bi vê heviyê serê de didane. Xizmên wê hinek tiştên wê weke bîranînekê anîne vir."

Projeya Mala Miryem li avahiyek biçûke, lê gelek kar têde ye. Ji bo van bîrdariyên ku biryare di salên pêş de werin çêkirin weke destpêkekê ye.

**Mala Miryem ji çend beşan pêş tê?**

Herwiha Ziyad diyar kir ku Mala Miryem ji beşan pêk tê û wiha domand: "Beşa jinên ji enfalê rizgar bûne heye. Ew jin tên vir û qala çîroka xwe ya dijwar a jiyanê dikin. Beşê stodyonê heye. Xizmên enfalkiriyan tên vir û dîmenên wan tên girtin û agahî ji wan tên girtin. Tên belgekirin. Beşê domenteriyê jî heye. Ew çavkaniyên li ser enfalê hatiye nivîsandin tên komkirin."

Berpirsê Projeyên Rêxistina Hevkarî ya Elmanî ya li Kurdistanê Ziyad Fayiq diyar kir ku divê xizmên enfalkiriyan alîkariya wan bike û kelûpelên enfalkiriyan ên li gel wan hene ji bo wan bibin ku ev mal bibe muzexaneyek nîştamî ya ji bo nifşê bê.

Tevî ku li ser proseya enfalê re 34 sal derbas bû jî hîn hikûmeta Herêma Kurdistanê nekariye muzexaneyekê ji bo enfalê veke û bermayiyên enfalê kom bike û biparêze.

Yek ji xizmên enfalkiriyan Bextiyar Reûf ji Rojnews'ê re wiha axivî: "Mala Miryem ji bo komkirina kelûpelên ezîzên me cihek girînge. Ne ji aliyê hikûmet û partiyan ve hatiye avakirin. Wê weke muzexaneyek nîştimanî ji bo nifşê bê bimîne. Ev proje derbarê gelê Kurd û Kurdistanê de ye. Ev kelûpel bi nirxin ku li vir dihêlin. Weke xizmên enfalkiriyan, spasiya Rêxistina Hevkarî ya Elmanya û kesên Mala Miryem rêve dibin dikin. Min wêneyekî bavê xwe ji bo Mala Miryem aniye. Daxwazê ji xizmên enfalkiriyan dikim ku êşek xwe li vir bihêlin, daku ji bo nifşa bê bimîne."

**ROJNEWS**

# Projeyên aborî yên li dijî polîtikaya ambargoyê hatin destpêkirin

Heverokê Şeredariya Gel ya herêma Efrînê Mihemed Şêxo anî zaman ku bi polîtîkaya ambargoyê xwestin herêma Şehbayê vala bikin û got, berxwedana gelê herêmê polîtîkaya wan vala derxist.

**Zana Roj/ Şehba**





Em gihîştin astekê ku piraniya alîyatên ku di destê me de bidin sekinandin, ji ber nederbaskirina madeyên ziftê, hewldanên me yên ziftkirina hin riyên ku axin, bê encam dimînin."

Di siyaseta dorpêça girankirî a ku li ser herêma Şehbayê û her du taxên Helebê (Şêxmeqsud û Eşrefiyê) ji aliyê hikumeta Şamê ve hatiye ferzkirin. Di van çend mehên ku ambargo bi awayekî giran tê meşan din de, di her alî de gel zirarekê pir mezin dît. Herwiha teybet di demsala zivistanê de girankirina ambargoyê, bû zima herî mezin ya li dijî mirovahiyê. Ji ber ku rê û derfet li vî gelî hatin girtin ku nikarein pêdiviyên xwe yên herî jiyanî jî pêşewazî bikin; Rêveberiya Xweser çiqas xwast ku ji bo pêdiviyên gel madeyên sotemenî û pêvîstiyên din ên jiyanî bişîne jî, rejîma Şamê rê neda ku ev alikariye bigihin cihê xwe. Herwiha vê rewşê bandor li xwandina xwandekaran û li pêşewazîkirina tendûrîstiya gel pir kir. Bi hezaran zarok bê xwandin man û bi hezaran mirovên nexweş bê derman û tedavî man. li kêleka ambargoya li dijî mirovahiyê, êrişên deewleta tirk ya dagirker li ser gel bê navber dom dike.

Têkildarî majarê bandora ambargoyê ya li ser xebatên şeredariyê û astaengkirina xizmeta gel di vê pêvajoyê de, hevserokê şeredaiyê ya herêma Efrînê Mihemed Şêxo ji rojnameya me re axivî.

**"Bi ambargoya aborî dixwazin herêmê bidin valakirin"**

Mihemed di axaftina xwe de anî ziman ku gelek polîtîkayên valakirina herêmê ji aliyê dewletên derdor li ser wan hatin meşandin. Da diyarkirin ku bi vê politikayê xwastin him di aliyê siyasî û leşkerî ve, hin jî bi riya lewazkirin aborî ve gel bê vîn bikin û mecbûrê radestkirina xwe bikin û wiha axiftina xwe domand: "Mayîndekirina gelê Efrînê û Şehbayê li vê deverê, ji aliyê plan û projeyên wan yên li ser herêmê ji bo hikumeta Şamê û dewletên din yên hevpar xeteriyeke mezin didin avakirin. Taybet ji ber ku ev herême di bin serweriya rêveberiya xweser de ne, lewma xwesteka wan ew e ku bi her awayî herêma Şehbayê tengav bikin û valabikin. Pir caran bi riya kiryarên leşkerî û siyasî xwestin herêmê valabikin. Lê belê, negihîştin armanca xwe. Ji ber vê yekê niha dixwazin bi riya tengavkirina aborî, siyaseta xwe bidin meşandin."

**' Ji ber ambargo karên xizmetguzriyê kêm bûn e'**

Mihemed di axaftina xwe de da diyar kirin ku ev ambargoya ku tê meşandin bandoreke sereke li ser xebatên xizmetguzariyê dike û wiha dom kir: "Ji ber ambargoyê tavahî xebatên herêmê bi awayekî hatin tevizandin. Tvî hemû zehmetiyan û kêmderfetan jî, Bi şaredarî hewil dide zêdetir xizmeta gel bike û pêdiviyên bingehîn yên weke (nan, av, kehrebe, çêkirina riyan û paqijiyê) ji gel re peyda bike. Mînak, elektirîk berê rojê 6 seatan dihat lê ji neçarî em niha tenê 3 seatan êvarî didin, di heman demê de di hefteyekê de tenê carekê paqijî tê kirin, herwiha di milê belavkirina avê dejî kêmasiyên me derdikevin.

**'Pêwîste rêxistinên mirovî bi erkê xwe yê exlaqî rabin'**

Hevserokê şeredariya herêma Efrînê Mihemed Şêxo da zanîn ku li ser gelê Şehba siyasetên qirêj tên meşandin û axaftina xwe wiha qedand: "Herêma Şehbayê di bi siyasetên rêjîmê yên qirêj re derbas dibe, di asta gîştî de hesab û lihevkirinên metirsîdar yên li dijî gel li ser vê cografiyê tên kirin, li ser vê bingehê em bangawaziya tavahî rêxistiên têkildar dikin ku li hember van sûcên ku tên kirin bê deng nemînin û zagonên xwe ji bo mafê koçberan pêk bîninû bi erkên xwe yên exlaqî rabin."

# Komeleya wênekêşiya fotografîk a Sûrî

**Norşîn Sîno \ Qamişlo**



Komeleya Wênekêşiya Fotografîk a Sûrî ku di bin siya Tevgera Civaka Demokrat (Tev_Dem) de, li bajarê Amûdê yê Rojava yê Kurdistanê hatibû avakirin , ji bo hezgiriyên wênekêşiyê bû ye deriyekî perwerde yê.

Ji ber pêwîstiya deverê bi pêşketinê ji mile wênekêşiyê ve hebû û her wiha ji bo newindabûna mîrat ên deverê, di 30`ê çileya 2021`an de Komeleya Wênekêşiya Fotografîk a Sûrî di bi suya TEV-DEM 'ê li bajarê Amûde hat avakirin.

Komele ji 290 wênekêşên jin , ciwan û mêr pêk tê , ne tenê wênekêşên Rojavayê Kurdistanê, wênekêşên gelek dever û bajarên Sûriyê bi giştî jî cihê xwe di nava komeleyê de digrin û tevlî çalakiyên wê dibin.

Herwiha bi riya vê komeleyê wênekêş hê zêdetir fêrî wênekêşiyê dibin û beşdarî pêşangeh , çalakî û festîvalan dibin û wêneyên xwe pêşkêş dikin . Bi vî awayî wênekêş rastî û şaştiyên xwe nasdikin û xwe pêş dixin.

Ji dema avakirina komeleya wênekêşiyê û heta niha 8 pêşengeh hat li darxistin, tê de wênekêş wêneyên ku kişandine pêşkêş kirin û hatin nirxandin , herwiha 13 çalakî hatin lidarxistin , di çalakiyan de wêne ji kevnareyên deverê re hatin kişandin û tewsîq kirin. Û hîn jî çalakî berdewamin.

Herkes ê wênekêş an ku herzkiriyê wênekêşiyê ye dikare li gorî şert û mercên tevlîbûnê, tevlî komeleyê bibin. Şert û mercên tevlîbûna komeleyê li gorî rêziknameya komeleyê ev in;

1_ Wêneyekî şexsî
2_Wêneyekî nasnameyê
3_Kurtejiyan (CV)

Û piştî demeke ji tevlîbûnê nasnameya endamtiya komeleyê ji her endamekî re derdikeve , di riya nasnameyê de derfet ji wênekêşan re çêdibin ku karê wênekêşiya azad bike.

Çalakî û komxebatên komele li dardixe bê pere ye, û bi alîkariya saziyên (TEV_DEM) tên birêvebirin.



# Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê: Pêwîste piştevanî di asta herî bilind de bê kirin

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê diyar kir ku dewletên li ser xetên erdhejê avahiyên bihêz ên li hemberî erdhejê çênekirî ne lewma, berpirsyarên yekser û sereke yên vê hilweşîn û komkujiyê ne û got, em bang li gelên xwe dikin ku bi hawara banga alîkariyê ve bigihêjin

**Navenda Nûçeyan**



Derbarê erdheja li Kurdistanê Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê daxuyaniyek weşand.

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê di daxuyaniya xwe de sersaxî ji malabatên qurbaniyan re xwestû şîfa ji birîndaran re xwest û wiha got: "Dewletên ku li ser xetên fayê avahiyên qewîn ên li hemberî erdhejê çênakin, berpirsyarên sereke yên vê hilweşînê û komkujiyê ne. Ji ber ku ew pêvajoya avakirina bajêr weke berjewendiyên takekesî û ticaretî dibînin. Beriya ku ewlehiya avahî û jiyana gel, bifikirin û li gor wê avahiya saz bikin ew li avakirina derfetên takekesî digerin û xwe li ser vê didin jiyankirin."

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê da xuyakirin ku rêveberiya faşîst a AKP'ê di desthilatdariya xwe ya 20 salan de her qada jiyanê ya welêt xera kir; veguherand cihekî ji betonê û hebûna xwe jî spart vê (berjewendî)rantê û wiha domand: "Lewma ji encama hilweşîner û komkujiya ji ber erdhejê ya li Kurdistanê û Tirkiyeyê, rêveberiya AKP-MHP'ê ya faşîst ku rejîmeke qirker mêtinger e. Serkêşê wê Recep Tayyîp Erdogan e û di asta sereke de berpirsyar û sûcdar in. Bi agahiyên li ser erdhejê re dibe ku Erdogan ê faşîst li qesra xwe gotibe 'Ev jî xêra Xwedê ye'! Ji ber ku Erdogan ê faşîst û derdora wî ya diz, bêyî ku xwe bigihînin cihê erdhejê erdhej weke 'Afet a Nifşa 4'emîn' ragihandin. Yanî banga alîkariya madî ya navneteweyî kirin."

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê da zanîn ku ji ber ku dewleta Tirkiyê 'fona afetê' ya di xezîneya dewletê de kom kiribû, di şerê qirkirin û mêtingeriya li dijî gelê Kurdistanê bi kar anî, alikariya ji bo mexdurên erdhejê weke 'Xêra Xwedê' pênase dike û ji bo berjewendiya xwe dest bi komkirina fona erdhejê ya li ser mirina û mexdurên erdhejê, kiriye.

Komîteya Ekolojiyê ya KCK'ê bang kir ku gel li benda destwerdana dewleta faşîst ya nemîne û got: "Em bang li gelên xwe dikin ku bi hawara banga alîkariyê ve bigihêjin.Roj roja mezinbûna bi hev re ye, ew roj e ku piştevanî di asta herî bilind de bê kirin. Bi vî rengî em li her qadê bikevin nava liv û tevgerê."

# Heyva Sor ya Kurd li hemû deverên ku pêwîstî heye kon vedan

**Rojbîn Zagros/Qamişlo**

**Heyva Sor ya Kurd bi karê xwe yê lezgîn bal kişand ser pêwîstiyên gelê mexdurên erdhejê û da diyarkirin ku ew ji bo ku alikariya gel bikin amade ne û banga rêxistinên mirovî jî kir ku alikarî bigihînin mexduran.**





Di encama erdheja bihêz ya li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê, gelek ziyanên mezin yên madî û canî gihîşt gelê rojhilatê Sûriyeyê jî. Bi hezaran kes jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Hê jî jimara qurbaniya zêde dibe. Herwiha gelek avahî hilweşiyan, di heman demê de tîmên rizgarkirinê lêgerîna kesên rizgarbûyî di bin xirbeyan de berdewam dikin.

Ji ber rewşa awarte ya îhtimala ku careke din erdhej rû bide, Heyva Sor ya Kurd bi hevkariya Rêveberiya Xweser û Desteya Tenduristiyê re, li gelek deverên bakur û rojhilatê Sûriyê kon vedan. Da ku di welatiyên ji bo parastinê li derve dimînin di van kona de xwe bi cih bikin.

Li Qamişlo jî li stada 12`ê Adarê û ya Heysem Kiço, kon hatine vedan. Herwiha wê tîmên tenduristiyê tevî destwerdanên lezgîn li seranserê Qamişlo hatine belavkirin.

Endamên Heyva Sor jî dan zanîn ku şert û mercên stargehên gel ava kirin erkê wan e. herwiha dan zanîn ku ew amadekariya xwe li hember dubarekirina erdhejê dikin.

Endamê Heyva Sor ya Kurd Dilgeş Îsa jî di derbarê beşdarbûna welatiyan ji bo konên ku li stada 12`ê Adarê li Qamişlo hatibûn vedan ev nirxandin kir: "Me li stadyûma 12`ê Adarê çar kon vedane û me dît ku ev hejmar hindik e, lewra şeva borî kon tijî bûn. Ji bo wê jî niha em li ser zêdekirina jimara konan kar dikin. Herwiha di her konî de jî alavên germkirinê û xizmet heye."

Endamê Heyva Sor ya Kurd Dilgeş Îsa di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser alîkariya mirovî û got, mirovahî yek e û nabe ku cûdahî tê de hebe. Gelek avahî li Sûriyê di dema şer de rastî êrîşên asmanî û bombebarankirinê hatin. Niha jî gelek avahî ji ber erdhejî hatin hilweşandin. Ji bo wê jî dema ku alîkarî ji Tirkiyê re were dayîn, pêwîste ji herêmên me re jî were dayîn. Tiştê ku bi serê welatiyên sûriyê hat bi serê ti kesî nehatiye kirin. Ji bo wê jî divê mirovayî dûrî berjewendiyên siyasî be. Herwiha em bang li rêxistinên navdewletî û yên mirovî dikin ku alîkariyeke lezgîn pêşkêşî gelê Sûriyê bikin.

# Li Rojhilatê Kurdistan û Îranê serhildana gel didome

**Navenda Nûçeyan**

**Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îranê di roja 145'an bi hemû hêza xwe didome. Tevî ku rêjîma Îranê li hemberî xwepşanderan işkence, girtin û kuştinê jî dike, gel bi biryardariyeke mezin serhildana xwe dewam dike.**

**Serhildana gelan ya bi qetilêkirina Jîna Emînî re û di bi dirûşmeya 'Jin, Jiyan, Azadî' Li Rojhilatê Kurdistan û Îranê hatibû destpêkirin, di roja 145'an de dewam dike. Tevî hemû zehnmetiyan û şideta ku rêjîm bikar tîne jî, gelên Rojhilatê Kurdistan û Îranê ji destpêka serhildanê ve û heta niha kolan bernedan e û li dijî rêjîma Îranê dengê xwe bilind dikin.**

**Di 6'ê Sibatê de ciwanên bajarê Sinê yê Rojhilatê Kurdistan daketin kolanan û agir pêxistin. Li beramberî girtîgeha Sine û avahiya sereke ya hêzên taybet, ciwanan çalakiya xwe lidarxistin. Ciwanan bê navber dirûşmeyên dijî desthilatê qêriyan û ragihandin ku ewê çalakiyên xwe dewam bikin.**

**Li bajarên din yên Rojhilatê Kurdistan û Îranê jî tevî dorpêçek zêde ya hêzên Îranê, çalakiyên cûr becûr hatin lidarxistin. Xelk li gelek bajaran daketin kolanan û agir pêxistin, poster û nîşanên desthilatê hatin şewitandin.**

**Li gorî malperên fermî yê girêdayî Rêjîma Îranê, duh Ayetullah Elî Hamaney, ji bo cejna neteweyî ku nêz dibe, efû îlan kir. Lê efû bi şertê poşmanbûnê ye. Duh li dijî vê biryarê Rêxistina Efûya Navneteweyî (Amnesty International) ragihand ku ew biryar ji bo dawîkirina nerazîbûnên navnetewî ya li beramberî zextên li ser xwepêşanderane;**



# KOMPLOYA MEZIN A GLADÎO...

Derketina ji Sûrî bi operasyona NATO-Gladîo re têkildar e. Eger em ji hev cudabûna di nava artêşa Tirk de û Gladîo'yê li ber çavan negirin, em nikarin vê komployê rast şîrove bikin. Bûyerên rejkujî û koployê şêrê hegemonya yê li dijî gelên Rojhilata Navîn in

**Derketina Ji Sûrî (Beşa 1)**

**Bûyerên rejkujî û koployê şêrê hegemonya yê li dijî gelên Rojhilata Navîn in**


... Ji xistina text a Siltan Ebdulhemîd heta bi hewldana reşkujiyê ya Mistefa Kemal, ji pêvajoya
qirkirinê ya li dijî Kurdan a bi komploya 15'ê Sibata 1925'an a li dijî Şêx Seîd dest pê kir û heta bi
komploya darvekirina Seyîd Riza ya 18'ê Mijdara 1937'an, ji girtina Firqeya Serbest a 1930'an heta bi
xistina Înonî ya ji serokwezaretiyê ya 1937'an, ji darbeya leşkerî ya 27'ê Gulana 1960'î heta bi darbeya postmodern a 28'ê Sibata 1998'an û herî dawî jî piştî salên 2000'î amadekariyên darbeyê bi qasî sed salek derbas bûye û di tevahiya van bûyerên bi vî rengî de şerê heman xetê dewam dike. Destpêkê Elmanya, pişt re li gorî rêzê hêzên hegemonîk Ingilistan û DYE'yê ji derve destek
dane van şeran û bi vî awayî kontrol kirine. Ev bûyerên reşkujî û komployê, hemû şerên hegemonyayê yên li dijî gelên Rojhilata Navîn, nexasim li dijî gelên Anatolya û Mezopotamyayê ne. Ji van şeran a para berxwedana Kurd a PKK ku pêşengiya wê dike, çar demên girîng ênşerê Gladîo ne ku min di
beşên berê de bi awayekî pêşnûme pêşkêş kiribû.

**Şerê hêzên hegemonîk bi kirasê faşîzma Tirkê Spî dewam dikir**

Şerê hêzên hegemonîk ên kapîtalîst bi kirasê faşîzma Tirkê Spî dewam dikir. Ji dema M. Kemal ve beşekî
di nava artêşê de yê ji vê zivêr hebû. Ev beş welatparêz û Anatolîparêz bû. Ji darbeya 27'ê Gulana
1960'î heta bi amadekariyên darbeya piştî salên 2000'î rewşa vî beşî ji komploger û darbekaran
cuda bû. Li pişta darbekar û komplogeran, bi awayekî bingehîn NATO û Gladîo'ya wê hebû.
Herweha di nava civaka sivîl de navend û şaxên xurt ên herdu aliyan jî hebûn. Ev di nava xwe de
timî xwedî nakokî û têkilî ne. Li gorî deman, serdestiya wan a li ser hevdu diguhere. Ji aliyê çînî ve jî divê 'bûrjûwaya mîllî û hevkar' temsîl bikin. Berî ku ez ji Sûrî derkevim, di navbera van herdu beşan
de jî, dîsa hevrikî û dijayetî serî dabû. Dijayetî di navbera beşê alîgirê diyaloga bi me re û yên dijberê wan, bi desteka Îsraîl û DYE'yê baskê NATO-Gladîo ango beşê alîgirên şer û îmhayê serdest, hebû.

**Ne rast bû ku ez li rizgarkirina xwe fikiribam e**

Beriya derketinê, bi demeke kin îstîxbarata Îsraîlê bi awayekî neyekser, bi israr peyam dida



ku divê ez ji
Sûrî derkevim. Min veqetîn di cih de nedîtibû. Min fikar dikir ku wê statuya me ya li Sûrî derbeyeke mezin
bixwe. Min ji aliyê stratejîk û îdeolojîk ve rast nedidît. Şer wê di riya xwe ya xwezayî de bimeşiya, di
çarenûsê de çi hebû wê ew biqewimiya. Ez ne li ser xeta çarenûsî bûm lê, ji bo min helwesteke
manedar a dijçarenûsê nebû ku ez rabûma min xeta leşkerî, polîtîk û îdeolojîk a 30 salî bidiya aliyekî û rota biguherta. Divê ez duristbûma, ne rast bû ku ez li rizgarkirina xwe fikiribam e. Piştî ku Atîlla Ateş li ser navê NATO-Gladîo cara dawî hişyarî da, eger Sûrî û Rûsya bi awayekî bi
biryar pişta me bigirta şensê me hebû ku me tekoşîn derxista asteke jortir û bêhtir berfireh bikira. Lê
bihêlin em vê destekê bibînin, herdu welatan hêza wan tinebû ku giraniya min a şexsî rakin, an jî ji bo
vê niyeta wan tinebû…

**Wê dewam bike. (ji Pirtûka**

## DIRÛTIYA DEWLETAN DI ERDHEJ Û BOBELATAN DE!



**DILYAR CIZÎRÎ**

Erdheja destpêka roja duşemê li Bakur û Rojavayê Kurdistan, beşek ji Sûriyê û Tirkiyê pêk hat. Bandorek mezin li gelek herêman kir. Bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran kes birîndar bûn. Zirara wê ya herî mezin jî li bajarên Bakurê Kurdistanê û Sûriyayê bûn. Li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ku demek dirêje di bin dorpêça hikûmeta Şamê de ne, jî bandora erdhejê zêde bû. Di encamê de hejmarek kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Hejmarek ne kêm avahî hilweşiyan û bi erdê re bûn yek. Halê şêniyên wê halê gelek bajarên din ên bi erdhejê bibandor bûn.

Piştî erdhejê YE, DYA û gelek welatên cîhanê xemgîniya xwe derbarê bobelatê anîn ziman. Di nav de hinek welatên ereb ên wekî Qeter û Misr. Di heman demê de rayedarên wan dewletan gotin ew ê alîkariyan pêşkêş herêmên mexdûr bikin. Tevî derfetên dewleta Tirk ji derfetên xelkên Sûriyayê zêdetirin, di serî de Qeter alîkariyên xwe demil dest ji hikûmeta Tirkiyê re pêşkêş kirin. Misra demek dirêje têkiliyên xwe bi Tirkiyê re qut kirine, diyar kir ewê alîkariya Tirkiyê bikin. Aliyên din jî piştevaniya xwe ya bi Tirkiyê re anîn ziman. Lê heta niha ne Misir û welatên ereb û ne jî aliyên din ji gelê Sûriyê re tu alîkariyên cidî pêşkêş ne kirine.

Dewleta Tirk û çeteyên wê mexdûrên herêmên dagirkirî û di serî de Efrîn, Idlib, gundewarên Helebê bê alîkarî hiştin. Hejmarek mezin welatî demên dirêj di bin bermahiyên avahiyên rûxanî de man, bêyî tu kes alîkariyan ji wan re pêşkêş bikin. Dewleta Tirk wekî her car vê care jî şêniyên wan herêman bi tenê hiştin û tu alîkariyên ber bi çav pêşkêş ne kirin.

Şêniyên taxa Şêxmeqsûd ên demek dirêj di bin dorpêça hikûmeta Şamê de ne û rêveberiya wê ya xweser û şênî bêyî li benda alîkariyên tu kesî bin, bi derfetên xwe yên kêm ketin liv û tevgerê û dest bi rizgarkirina şêniyên di bin bermahiyên avahiyên rûxandî de mayî kirin. Heyva Sor a Kurd hêza xwe ji bo dermankirina birîndaran xist dewrê.

Li Kobanê û Minbicê jî hin xanî ruxiyan û hejmarek welatî birîndar bûn. Zirarên madî jî gelek çêbûn. Li van herêman jî Rêveberiya Xweser serferberî ragihand û li gorî derfetên di destê xwe de alîkarî ji şêniyan re pêşkêş kirin.

Şêniyên li herêmên hikûmeta Şamê jî jiyan dikin, berê ji ber siyasetên hikûmeta Şamê û bandora şerê 12 salan ên şerê li Sûriyayê rewşeke dijwar jiyan dikin. Vê bobelata Erdhejê zehmetiyên wan hîn girantir kir. Lê ne hikûmeta Şamê erka xwe pêk anî û ne jî welatiyên di daxuyaniyên xwe de îda kirin, ew amade ne alîkariyan pêşkêş bikin, kirin.

Li jor me pir bi kurtasî be jî rewşa herêman yek bi yek anî ziman. Lê em dinerin di serî de welatên ereb û welatên din jî berê baş dizanin rewşa gelê Sûriyayê çi dijware û pêwîstiyên wan zêde ne, lê carde jî alîkariyên wan li gorî berjewendiyên siyasî bûn.

# 'Em bi yek destî li serok Apo xwedî derkevin

**Li hemberî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nerazîbûna civaka Êzidî her roja derbas dibe mezin tir dibe. Welatiyên Şengalê bi dawî anîna tecrîdê û azadiya fizîkî ya Serok Apo dixwazin.**

Li Şengalê her diçe bertek û nerazîbûna civakê ya li dijî tecrîd û zextên li ser Rêber Ocalan mezintir dibe. Şengaliyan bal kişandin ser xizmeta ku ji hemû civakên bindest re kiriye û xwestin di demek zûde dawî li tecrîdê bê anîn.

Welatiyê bi navê Îlyas Enco di serî de bal kişand ser tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd



Abdullah Ocalan û wiha got; "Ez bang li hemû sazî û dezgehên mafên mirovan dikim, bila rewşa Serok Apo bipirsin. Dema fermana li ser civaka Êzidî anîn ji derveyî Serok Apo û yên xwediyê fikrê wî hatin bi meve, em rizgar kirin û ti tişt jî ji me kêm nekirin."

Ciwanê bi navê Hesen Dugorî jî bang li hemû civaka Êzidî a li çar aliyên cîhanê kir ku dest bidin hevdû û xwedî li Serok Apo xwedî derbikevin û wiha pêde çû; "Em dengê xwe digihînin hemû cîhanê, hemû dewletên derve û Êzidiyên li çar aliyê cîhanê û dibêjin dest bidin hevdû û xwedî li serok Apo derkevin. Em dixwazin hemû li kûderê jî bin bo wî rabin ser xwe. em vê bindestiyê hew qebûl dikin û dibêjin êdî bese."

Jina ciwan Nesrîn Sinunê jî got; "Serok Apo 15'ê Sibatê di encama xayîntiyê de hate girtin. Em miletê Êzidî dibêjin ji ber ku ew di rojên reş de bi fikrê xwe hate hawara me, em jî van rojên reş de dost û hevalên xwe tinê nehêlin. Em jî Serok di rojên wî yên nexweş de tinê nahêlin. Heta em agahî jê negrin em nasekinin. Wek gel em nasekinin. Heqê her insanê di girtîgehê de hene pêre hevdîtin çêbibe. Divê xwedî lê derbikevin. Serok Apo insanekî xêrxwaz e. Ew xwe bi şervanên xwe gihand me û me ji fermanê parast. Em tecrîdê qebûl nakin. Her insanek xwedî hiqûq divê vê zilmê qebûl neke."

**ROJ news**



# Felaketa Erdhejê li Bakurê Kurdistanê

Di erdhejeke dijwar de li Bakurê Kurdistanê bi hezaran avahî hilweşiyan û bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Hikumeta AKP-MHP'ê jî di vê rewşêde de jî dijminahiya gelê kurd dike; bajarên Bakurê Kurdistan paşguh dike û ji aliyê saziyên dewletê ve hê tu alikarî ne gihiştine pir tax û bajaran.

**Navenda Nûçeyan**

Di sibeha 6'ê Sibatê de, seat 04.17'an de li navçeyan Pezercixê ya Bakurê Kurdistanê erdhejek diwar bi pileya 7.8 pêk hat. Piştî wê erdhejê saet di 04.26'an de jî li navçeya Nurdagi ya bajarê Dîlokê erdhejek duyemîn a bi pîleya 6.4 pêk hat. Erdheja dijwar, di serî de bajarên Amed, Meletî, Riha, Semsur, Dîlok û gelek deverên din ên Bakûrê Kurdistanê, bajarên Edene, Hatay, Kilîs, Osmaniye û Qeyserî ên Tirkiyeyê hejand û di encamê de bi hezaran avahî hilweşiyan. Li gorî daxuyaniya AFAD'ê hejmara mirovên ku jiyana xwe ji dest dane, gihîştiye 3 hezar û 381 kesî û 20 hezar û 426 kes jî birîndar bûne. Herwiha 7 hezar û 840 kes jî bi saxî hatine rizgarkirin. Lê ji ber ku heta niha pir kes ku bi zalalî hejmar nayê zanîn, di avahiyên hilweşiyayî de mane jimara qurbaniyan, bi giştî nayê zanîn.

Li gorî AFAD'ê ji duh ve li Pazarcixê ji duh ve zêdetirî 130 erdhejên biçûk çêbûne.

**Hukumeta AKP-MHP'ê felaketên xweza jî li gor berjewendiyên xwe bikar tîn e!**

Hikumeta AKP-MHP'ê wekî



her car hewil dide ku bûyeryan jî felaketên ku diqewmin bixe berjewendiyên xwe yên desthilatdariyê. Lewma li gor axifftin û ragihandina profesorên jeolojî yê, yên Tirkiyê pir caran berpirsyar di derheqê vê erdhejê de şiyar kirin e û ji bo pêşîlêgirtinê jî, pir piroje pêşkêşî kirîne. Lê dîsa jî, rûdana erdhejê re tedbîrên pêwîstî nehatîne girtin û niha jî alîkariya pêwîst ji mexdurên erdhejê re nayê kirin.

Heta dema nivîsandina vê nûçeyê jî hikumeta AKP/MHP'ê tîmên rizgarkirinê neşandiye gelek navçeyên Bakurê Kurdistanê û li wan navçeyan tenê welatî bi derfetên xwe yên kêm hewil didin ku kesên di bin avahiyan de mane, rizgar bikin. Herwiha desthilatdariya AKP-MHP'ê vê carê jî ferz dike ku alîkariya mirovî bi rêya AFAD'ê bê kirin û bi vî rengî nehêle ku alîkarî kom dibe bigihêje mexdûrên rasteqîn ku destpêkê bigihêje alîgirên wê û di nava felaketeke wisa de jî bi du tunekirina kurdan ketiye!

**Felaketa erdhejê**

- Li gorî agahiyên ku hatine bi destxistin, li Antakya, Kirikhan, Defne, Samandag û Skenderûnê jî bi hezaran kes di binê xirbeyê avahiyan de mane. Herwiha çalakvanên bajêr li ser medyayên civakî diyar kiribûn ku li piraniya avahiyên bajarên ku lê erdhej çêbûyîn, zerar dîtine.
- Li gorî ku hatiye ragehand li Dîlokê jî heta niha 533 avahî hilweşiya ne û 200 kesî jî, jiyana xwe ji dest dane. Li navçeyên Nûrdagi, Îslahiye û Şehîtkamîl hîn jî karên lêgerîn û rizgarkirinê dewam dikin. Li beşeke mezin a bajêr elektrîk qut bûye, şêniyên herêmê li rawestgehên otobusan, li parkan û kêleka rê hewl didin bi derfetên xwe agir dadin û xwe germ bikin. Li navenda bajêr Jî mirov ji bo bidestxistina Sûtemeniyê û nan ketine rêzê. Li gorî agahiyan heta niha ti alîkarî negihîştiye herêmê.
- Li Semsûrê jî ji ber erdhejê bi sedan avahî hilweşiyane, gel bi derfetên xwe karê rizgarkirinê dimeşîne. Di nava rojê de bi dehan kes ji binê xirbeyan hatin derxistin, tê gotin ku hîn jî bi sedan kes di binê xirbeyan de ne. Karê ku gel bi derfetên xwe dikir bi şevê û baranê re sekinîn. Tevî ku demeke dirêj di ser rûdana erdhejê re derbas bûye, hîn jî tîmeke rizgarkirinê negihîştiye bajêr.
- Elbistanê jî para xwe ji erdhejê girt û nîvê avahiyên li navenda navçeyê hilweşiyan û zerareke mezin dîtin. Li navçeyê hejmara windahiyan di asteke bilind de ye. Li gundên Elbistanê jî di asteke metirsîdar de hilweşîn çêbûye û hîn jî tîmên lêgerîn û rizgarkirinê negihîştine herêmê.
- Li Amedê li navçeyên Rezan, Bajarê Nû û Peyasê 7 avahiyên hilweşiya ne, karên lêgerîn û rizgarkirinê dewam dikin. Li gorî daneyên fermî yên nexweşxaneyên dewletê, li Amedê 49 kesan jiyana xwe ji dest dan, 562 kes jî birîndar bûn e.
- Li Riha û navçeyên wê jî gelek avahî ji ber erdhejê hilweşiyan. Li navenda bajêr û navçeyên Hewag, Berecûk, Pirsûsê 60 avahî hilweşiyan. Li navenda Rihayê li navçeyên Halîliye û Eyûbiyeyê nêzî 20 avahî hilweşiyan û gelek kes di binê xirbeyê avahiyan de mane.

**Alîkariya welat erkê her Kurdekî ye**

Rewşa heyî ya walatiyên Tirkiyê teqez kir ku dewlet û saziyên dewletê ji bo berjewendî û pêvîstiyên gel ne hatîne avakirin. Ji bo kesên di desthilatê de û saziyên wan hatîne avakirin. Hemû derfetên ku di di walad de bi dest xistîne jî dîsaji bo gel nayên bi karanîn û koma desthilatê û derdorên wan ji bo ku xwe dewlemend bikin û li her walatekê qesra ava bikin, dewlet hatine avakirin!

Hejayê bîranînê ye ku partiya HDP'ê û KCK'ê bangawaziya gel kir ku xwe bi hêviya wijdana dewleta AKP/MHP ve nehêlin û gel bixwe xwedî li hev derkeve û alikariya hev bike.

# Divê giranî bi tekoşîna bîrdozî bê dayîn

**Zekî Bedran**

yên ku ol ji bo armancên xwe yên siyasî wek amûr bikar tînin û di şiddetêde sînor nasnakin hene. Ev hêze bi giranî hatibin lawazkirin jî, lê bi gîştî nehatine sakinandin û hîn jî xeterin. Bi vê rewşa xwe, bi kêr hinek hêzan tên, lewma tên destekkirin. Ji bo ku ev rêxistin ji civakê bên dûrxistin, dewlet û dezgehên wan yên mûxaberatan divê, destê xwe ji wan bikşînin. Niha dikare bê gotin ku, li Îdlib ji bo El Nusra pergaleke dewlet hatiye avakirin. Ji aliyê leşkerî ve parastina Îdlib dewleta Tirkiyê dike. Her wiha herêmên ku dewleta Tirkan li Sûriyê dagirkirine, DAÎŞ jî di navde hemû çete û yên benê xwe qetandine, weke bûhiştekê ne.

Li Sûriyê serîyeke din jî hebûna pergala Baas`e. Rûxmî dewleta Tirkan û rêxistinên ku destek dikirin jî, pergala Baas hilneweşiya. Bi alîkariya Îran û Rûsya re, Esed karî rêveberiya xwe biparêz e. Vê yekê jî, ji aliyê birdozî ve hêza parastina fikra dewleta navîn ya netewperestiya ereban bi xwe re anî. Avahiya dewleta navendî weke qeder e, her wekî ku bijardeyek din nîne, dixin mejiyê hemû kesî. Yên ku ji derveyê vê fikrê derkevin jî tên armanç girtin.

Îran a ku hatibû alîkariya hûkûmeta Sûriyê jî, xebatên xwe yê bîrdozî bi bandor didomîne! Bi piştgiriya hukumetê ya leşkerî, aborî û dîplomatik de sînordar namîne. Di nava gel de hêzên xwe yên mîlîs jî ava dike. Vê yekê jî, bi bikarhanîna hestên gel yên olî û çandî dike. Qasî ji destî tê jî, vê bi belavkirina hişmendiya Şia dike. Bi bikaranîna xizaniya gel, hêzê diqulipîne û bi navendê ve dide girêdan.

Dewleta Tirkan jî ji bo ku desthilata xwe li herêmên dagirkirin mayînde bike, çanda xwe li wan herêman belav dike. Di dibistanan de perwerdeyên zimanê Tirkî mecbûrî dike, li ser esasê netevperestiyê hewl dide teşe bide gel. Teybet gelên din li hember Kurdan sor dike û hewl dide dijminayiya li dijî kurdan pêş bêxe. Her wiha xebatên ol û bîrdozî ya rêxistinên weke îxwanciyan jî misoger dike. Azadî û demokrasî, rêz ji bo baweriyan û mafê jiyanê yê çandên cûda, bi gîştî tên hedef girtin. Di wateya rast de fikir tên jehrî kirin!

Rûsya tenê bi misogerkirina desthilatdariya û berjewendiyên xwe ve mijûl e. Bi rêjîma Baas`re peymanê wan yê stratejîk heye. Armanca wa tenê, pergal û rêveberiya heyî parastin û li ser piyan girtin e. Lewma rola ku ew li Sûriyê diliyîze, bi giştî başverûti ye. Hember vê DYA û hêzên din jî, diyar dikin ku wan hebûna xwe di şerê li hember DAÎŞ`ê re sînordar kiriye. Bi taybetî DYA û Îsraîl li şûna ku rêjîm bê hilweşandin, lawazkirina wê li gor berjewendiyên xwe gûncavtir dibînin. DYA û Ewropa Tirkiye ku endamê NATO ye, destek dikin û dagirkeriyê wê bi şêwazekê nerm dikin û hewl didin bipejirînin. Her wiha ji bo vebijêrka demokratik bi bandor nebe, destek didin dagirkeriya faşîst a Erdogan. Rûsya jî, di rewşa heyî de rêjîma Erdogan destek dike. Ji ber ku dizanin xala lawaz ya Tirkiyê pirsgirêka Kurd e. dixwazin vê bi xurtî bi kar bînin.

Li gor van pênaseyan, li Sûriyê qada tekoşînê ya sereke tekoşîna bîrdozî ye. Ew qasî cûdatiya hêz û berjewendiyan, ew qasî rêbazên cûda yên fikrên radîkal, di Sûriyê de nava tekoşîneke pir girande ne. Rêveberiya Şam`ê rûxmî hemû lawazî û bi zorî li ser piyan mayînê xwe jî, ji aliyê tekoşîna bîrdozî xwedî derfet e. Ji ber ku fikrê 'dewlet nebe civak jî nabe, dewlet hemû tişte' xistiye mejiyê gel. Hemû derfet û saziyên ragihandinê di destê wan de ye. Mafê jiyanê nade mixalefetê. Gel jî wek tê xwastin nehatiye perwerde kirin û ronî kirin. Yên ji xwe re dibêjin mûxalefet jî, bi granî di bin kontrola hêzên derve de ne. Ol û netewperestiyê jî, bi şêwazeke pir paşverû bikar tînin.

Ango yê ku tekoşîna bîrdoziya gelê Sûriyê bi rêxistin bike û gel perwerde bike, tenê Rêveberiyê Xweser e.

Di herêmên ku Rêveberiyê Xweser heye, gel bi rêxistinkiri ye. Hereketên Cûwan û Jin aktîfin. Xebateke pêşketî ya ragihandinê heye. Gel dikare li meclis û komînan de, xwe bi rêxistin bike. Akademiyên demokratik hatine avakirin. Çalakiyên gel berfirehin. Ber çavan xebateke bi bandor ya bîrdozî heye. Rûxmî van hemûyan Reveberiyên Xweser şerekî mezin yê nefsî û bîrdozî ve mijûl dibe. Ji bo ku van herêman hilweşînin û ji holê rakin, êrîşên pir alî berdewam dikin. Ji ber vê, berpirsiyarîyên Rêveberiyê Xweser pir mezin in. Tekoşîneke pir bi bandor divê bide meşandin. Bi rehetî dikare bê gotin ku di vê mijarêde lawaz e. Xebatên leşkerî û siyasî têrê nakin. Pêwîstî bi Teşegirtineke nûh ya çandî û zihnî heye. Tenê herêmên Rêveberiyê Xweser ne, divê xîtabê Sûriyê bi gîştî bê kirin.